# Newroz








*Dr Nûredîn Zaza*
1919- 1988

*Osman Sebrî*
1905 - 1993


*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ*


Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de


**Hejmar ( 88-89 )** **B. Çile** **2009 z - 2621 k** **Buha ( 15) )**


## Kurd di bîranîna mafên mirovan de

Hersal bi hatina roja 10-ê meha Berçile re , hemî partî , komele , rewşenbîr , hunermend , dezgeh û dewletên şaristanî , naverokên belgenameya mafên mirovan tînin zimên , xal û bendên wê belgeya navnetewî ya ku civata rêxistina netewên yekbûyî li sala 1948 an pejirandibû û li ser erê kiribû , dijmêrin . Di weşan û medya xwe de didine xuyanîkirin .

Hêjayî gotinê ye ku wê hîngê , di wê civata navnetewî û dîrokî de nûnerê dewleta Sûriyê birêz Faris Elxorî bû . Siyasetvan , rewşenbîr û mirovhezekî gewre û navdar bû . Loma jî , di nivîsandin û amedekirina reşika belgenameya mafên mirovan de xwedî roleke balkêş bû . Nemaze , ji bilî zimanê xwe yê Erebî , bi Firansî , Ingilîzî û Tirkî jî baş dizanî . Bêdudilî , bi xurtî û dilsozî li mafên mirovan dibû xwedî , û di ber nêrînên xwe de bi zarzimanekî zelal û lihevhatî şer dikir . Vêca bi xêra helwesteke weha û nûnerekî weke rehmetî Faris Elxorî , rûyê gel û dewleta Sûriyê, di civatên navnetewî de sipî û ciyê rêzgirtinê dibû .

Îro jî , piştî derbasbûna 60 salî di ser wê bûyera navnetewî re , her diçe pêwistî û giringiya wê belgenameya mafên mirovan bêtir dibe , û bona hebûn û jiyana mirov û gelan li seranserî herêm û deverên cîhanê pêdiviyeka li cî , zor pêwîst û bêhempa ye .

Li dawiya salên 1960 - iyan , li Şamê , sê berpirsiyarên serkirdayetiya dewleta Sûriyê berê xwe dabûne mala Osman Sebrî û jê dipirsîn : (( ustaz (mamoste) Osman , hûn kurdên

**D.R ( 15 )**

*Email : Newroz 95 @ hotmail . com*


**Îran Celadê..** — **Hemîd Muxtarî** — 3

**Çavê gelê …** — **Rêberê Silîvî** — 5

**Kurd Li Sûriyê…** — **Cotyar Murad** — ٦

**Di roja cîhanî.....** — **Lava Derwêş** — 8


www.arsivakurdi.org

Nûce û Calakî

# Goçbarkirina Mihemedê Tûj

Nûçe û Çalakî

Li dûriyê – Almaniya- Piştî berxwedaneke dirêj bi nexweşiyê re, siyasetmedar û nivîskarê Kurd birêz Mihemed Mele Ehmed yê bi navê Mehmedê Tûj dihat nasîn , di 29/09/2009an ji nav me barkir . Û di 04/10/2009 an de, Termê berêz digiha Qamşlo, bi beşdariya xwedî, berketî, tevgera Kurd, di goristana Qudûr Bekê tê binaxkirin.

Li ser gurnê, ev gotinên jêrîn hatin pêşkêşkirin :

1-Gotona sekretêrê p Yekîtî, berêz Fuad Elîko . 2- Endamê komîta siyasî ya El-partî, berêz M. Ismaîl . 3- Rêxistina Yekîtî ya Demokrat A Kurd li Sûriyê ( Yekîtî), berêz Ebdilsemed 4- Nivîskar, birêz Ibrahîm Mehmûd û ji aliyê melbatê ve, Gotina hevjîna M. Tûj, birêz Keça Kurd,g Kurê wî Ebdirezaq û helbestek bi dengê keçek ji malbatê bi dawî bû. Hemî gotin li ser xebat û sinciyê xebatkarê me yê hêja bû.

M. Tûj di sala 1935 an de, li Dêrîkê ji dayîk dibe. Xwendina bilind, beşê dîrokê di ala 1968î zanîngeha Şamê kuta dike. Di destpêka temenê xwe de, bi kurdayetiyê mijûl dibe û di sala 1952 an de, bi Samî Mele Ehmed, Ebdilezîz Elî Ebdî û Derwîş Mele Silêman re, **Civata Yekîtiya Xortên Demokrat A Kurd- Cezîrê-** damezrandî.

Piştî damezrandina Partî di 14î Hizêrana 1957 an de, tevlî partî dibin. Di sala 196î de, tê girtin û demekê di zîndaznê de dimîne, Piştî ji zêndanê derdikeve, dev ji karê siyasî berdide. Lê, li rex milet û tevgera xwe dimîne. Di sala 1995 an de, berê xwe dide Almaniya . Li welêt û dûriyê pir berheman dinvîse . berhemên birêz M. tûj ev in: 1- Dîroka Partî qunaxa Yekê 1957 – 1965-1991- bi zimanê Erebî 2-Xoyêbûn, Civata - Serxwebûna Kurdî. 1927-1964 – sal 1993, bi zimanê Erebî. 3- Pêwendiyên Kurd û Ermenan –sal 1993, bi zimanê Erebî. 4- Bedirxan Mîrê Botan –sal 1999 bi zimanê Erebî- Almaniya. 5 – Pirsa Kurdî Li Sûriyê. Sal 2001 bi zimanê Erebî, Almaiya. 6- Xebatkarê Kurd ê mezin Osman Sebrî- sal 2003 bi zimanê Kurdî û Erebî di yek bergeyê de- Almaniya . 7-Qasimlo Evîndarê welêt sal 2004 – Almaniya 8- Kurdistan di navbera Dagîkirin û serxwebûnê de- sal 2005 bi zimanê Kurdê û Erebî – Almaniya.

Bi boneya koçbarkirina birêz, bi navê kovara Pirs û weşana Newroz "Behînama" Jêrîn ji malbata wî re rêbûye.

## Behîname

Malbata Mele Ehmed
Xwişka Keça Kurd
Malbata Buhuştî Mihemed

Bi dilekî tev kul û kovan, me nûçeya koçkirina kesayetiya, welatparêz û xebatkarê payebilind Mihemedê Mele Ehmed, li derveyî welêt bihîst.

Buhuştî Mihemed, di malbateke welatparêz de xwedî û perwerde bûye. Piştî ku wî çavên xwe li jiyanê vekirine û bîrewer bûye, zor û sitema li ser gelê xwe dîtiye, ew tevî rêzên Tevgera kurdî bûye, zend û bendên xwe vemaltine, bi dilsozî û hişmendî daketiye qada kar û xebatê. Bi wêrekî, dengê xwe dijî sitemkarî û zordariya ku li ser gelê Kurd dihate bikaranîn bilind kiriye, ciwaniya xwe di vê riya pîroz de winda kiriye û li zindanên destelata Sûriyê bûye mêvan.

Digel hemî dijwariyên jiyanê, buhuştî Mihemed riya bîr û baweriyên xwe bernedaye, her û her, ta roja dawiyê ji temenê xwe, ew girêdayê doza gelê xwe ya dadmend û rewa maye.

**Serê gelê Kurd sax be**
**Serê malbat û zarokên wî xweş be**
**Cihê wî buhuşt be!.**

***Kovara PIRS***
***Weşana NEWROZ***
***Sûriyê 01.10.2009z-2621K***

www.arsivakurd.org

# Îran Celadê Zarokan

Hemîd Muxtarî

Îsal di demekê de Roja Cîhanî a Xebat li Dijî Îdamê di seranserê cîhanê de hat bibîranîn ku bi hezaran kes li Îran û çend welatên din bi cezayê îdamî hatine mehkûmkirin û li benda birêveçûna biryara mirina xwe ne. Rejîma Îranê tenê rojekê piştî 10 Çiriya Pêşîn, anku Roja Cîhanî a Xebat li Dijî Îdamê, û 3 rojan beriya Roja Cîhanî a Zarokan li Îranê anku 8'ê Çiriya Pêşîn a îsal, Bêhnûd Şucayî, darvekir. Kiryarek ku tenê rûreşî bo Îranê bi cih hêla û bû sebebê bêzariya zêdetir a raya giştî ya cîhanê ji wê rejîmê. Bêhnûd Şucayî di 28 Gelawêja sala 1384'an a Rojî di pevçûnekê de li parka Venek a Tehranê di temenê 17 saliyê de, nûciwanekî bi derba kêran kuştibû. Navbirî piştre hat girtin û ji aliyê dadgehê ve bi cezayê îdamê mehkûm bû. Herçend ku çendîn welat, komele û rêxistinên mafê mirovan hem li navxwe û hem li derveyî welat û heta Yekîtiya Ewrûpayê jî bi rêvebirina kampayna îmzayan û derkirina daxuyaniyan daxwaz ji Îranê kirin ku Bêhnûd Şucayî, îdam neke, lê rejîma Îranê bê guhdan bi raya giştî a cîhanê û zext û givaşên navnetewî, roja 11'ê Cotmeha 2009'an, navbirî darvekir. Îrorojê di asta cîhanê de, seba ew hewl û cehdên saziyên parastina mafê mirovan, nemaze Rêxistina Lêborîna Navnetewî bona rêzgirtina zêdetir ji mafê mirovan, hejmara ew welatên ku biryara îdamê bi fermî betal kirine û hilweşandine, gihîştiye 94 welatan. Bi taybetî li kêleka me anku li welatên Turkiye, Ozbekistan û Tacîkistanê.

**Îran di pileya duyem a îdamkirinê di cîhanê de ye.**

Hêjayî gotinê ye ku di nava wan 58 welatên ku hêj biryara îdamê betal nekirine û birêve dibin, ji sedî 93 di jî, Îran Çîn di pileya yekem de ye.

Herçend ku rejîma Îranê di sala1994'an de Carnameya Mafê Zarokan îmza kir û li gor madeya 37 a Peymannameya Mafê Zarokan ku dibêje: "Nabe tu zarokek were îşkencekirin yan rastî riftar û kiryarên nemirovane bê, herwiha nabe biryara darvekirinê yan hepsa heta hetayî bê hebûna azadiyê, bo zarokên jêr temen 18 saliyê ku sûçê encam didin, were derkirin, dîsan em dibînin ku rejîma Îranê her ji sala1994'an heya niha ku nêzîkê 15 salan e, derdora 100 zarokên jêr temenê 18 saliyê li Îranê îdam kiriye û bo pitir ji 200 zarokên din biryara îdamê der kiriye Her di vê derbarê de, Saziya Efûya Navnetewî
vê dawiyê daxuyaniyek belav kir û rejîma Îranê wek celadê zarokan da nasandin. Herwiha navendên mafê mirovan li Îranê wek Saziya Parastina Mafê Mirovan li Kurdistanê, Çalakên Îranî ên Parêzerê Mafê Mirovan li Ewrûpa û Amerîkaya Bakûr, Komîteya Parêzerê Girtiyên Siyasî û Komîteya Nûçegihanên Mafê Mirovan û wd..., bi hinceta 10'ê Çiriya Pêşîn a2009'an, Roja Cîhanî a Xebat li Dijî Îdamê, raporên xwe derheq rewşa darvekirinê bi awayê jêrîn bo raya giştî eşkere kirin: Ji Çiriya Pêşîn a 2008'an heya Îlona2009'an, biryara îdamkirina 339 kesan li Îranê birêve çûye ku li gor sala borî, 53 kes zêde kiriye. Di nava wan 339 kesan de, 3 kes bi hovanetirîn awayî anku kevirbarankirinê hatine kuştin. 32 kes ji wan îdambûyan, girtiyên siyasî û ramanê bûn. 10 kes jin bûn. Di nava 120 kes ji îdambûyan de ku temenê wan di wê raporê de hatiye, 6 kes li jêr temenê 20 saliyê de bûn. Herwiha her di wê midehê de ku ev rapor hatiye amadekirin, biryara îdamkirinê ji bo 303 kesên din jî hatiye derkirin ku 20 kes ji wan girtiyên siyasî û ramanê ne. 12 kes ji wan bi cezayê kevirbarankirinê hatine mehkûmkirin û30 kes jî jin in. Temenê 16

D.R ( 4 )

www.arsivakurdi.org

**Dumahîk : Îran Celadê…**

16 kes ji wan jî di bin 18 saliyê de ye .
Darvekirina mirovan diyardeyek e ku di Îranê de roj bo roj xurt û berfirehtir dibe. Fenomenek ku rejîma Îramê her di detspêka bidestvegirtina desthilatê di sala 1979'an de, wek metodek bo jinavbirina neyarên xwe ên siyasî û hizrî û çavtirsandina xelkê bi giştî bikar aniye û tîne. Her di vê derbarê de em dikarin îşare bi îdamkirina çend hezar kes ji xelkê sivîl û bêtawan yê Îranê di sala1367'an a Rojî (1988) de bikin. Xelkek ku tenê bi tawana vê yekê ku cudahizr bûn, hatin îdamkirin. Niha jî bi sedan kes ji cudbîrên Îranî di girtîgehên rejîma Komara Îslamî de li benda îdamê ne.

Rejîma Komara Îslamî a Îranê dixwaze bi birêvebirina metoda îdamê cewek pirr ji tirs û xofê di civaka Îranê de pêk bîne û çanda tundûtûjiyê di welatê me de xurtir û cihgir bike. Bi baweriya hiqûqzanan, rejîma Îranê li cihê vê yekê ku li pey sedemên encamdana tawan û nerazîbûnên xelkê bigere û wan pirsgirêkan çareser bike, lê rejîma desthilatdar a Îranê bawer e ku dikare bi darvekirina xelkê pêşî ji encamdana tawanan û nerazîbûnên xelkê bigire. Lê pêvajoya bûyeran berevajî vê ramanê nîşan didin. Rejîma Îranê bi dirêjahiya 30 sal ji temenê xwe, bi pêlên berfireh ên îdamkirin û kuştina hezaran kes ji xelkê Îranê ne kariye pêşiya encamdana tawanan bigire û ne cudahizran ji holê rake. Lewra bo berlêgirtin ji îdamê, divê em li dijî hizara îdamê şer bikin ku gellek ji xebat li dijî îdamê giringtir e. Bi hêviya wê rojê ku ne tenê li Îranê belku li seranserê cîhanê îdamkirin û kuştina xelkê bi dawî were û cîhanek pirr li aştî û azadî û aramî pêk were. **Ji Kovara Agirî H. 121**

## Konfirasê Mafên mirovan


Roja 9ê Çiriya Pêşîn a 2009'an, li bajarê Diyarbekir li Kurdistana Bakur, çaremîn konferansa mafên mirovan yên Kurd, ji aliyê rêxistina ne hikûmetî ve, Pirojeya Mafên Mirovan yên Kurd (KHRP) û bi mêvandariya rêxistina hikûmetî ya Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) û bi beşdariya komek berçav ya rêxistin û kesayetiyên çalakên mafên mirovan hat lidarxistin. KHRP" rêxistineke ne hikûmetî û serbixwe ye ,ku di sala 1992'an hatiye avakirin û nevenda sereke ya wê saziyê li bajarê Landonê ye. Çalakiyên wê rêxistinê li ser bingeha karkirin bo pêşvebirin û parastina mafên hemû takên akincî yên herêmên Kurdistanê yê bê li ber sovgirtina cudahiyên, olî, ziman, regez û rav û nerînên siyasî û ramanên cuda. Nahîd Husênî wek rojnamevan û çalakvana mafên mirovan li Kurdistana Îranê ,di wê konferansê de beşdar bû û bi pêşkêşkirina gotarekê ,bal kişand ser binpêkirina mafên mirovan, ku di çarçoveya yasaya giştî de û bi navê ol di welatê Îranê de tê meşandin ,û herwiha amaje da jiyana pir dijwar , asteng û pirsgirêkên li hemberî takên Kurd di Kurdistana Îranê de, ku di hemû warên siyasî, civakî û kultûrî de dimeşînin. Hêjayî gotinê ye, ku roja 9ê Çiriya Pêşîn a 2009'an, Nahîd Husênî û şanda Kurdistana Başûr serdana şaredariya bajarê Diyarbekir kirin, û ji aliyê Osman Baydemir, serokê şaredariya Amedê bi germî hatin pêşwazîkirin.



www.arsivakurdi.org

# Çavê gelê Kurd Bi girtina têkoşerên wî naşike!!

Rêberê Silîvî




Sibeha roja sêşemê 20.10.2009an, dezgeha asayişa rêzanî ya dewletê li bajarokê Amûdê, dest danî ser têkoşer û xebatkarê Kurd ê navdar **Behcetê Begê** (Bavê Şino), û ew şandiye şaxa Hisiçê, û ta vê gavê, rewş û çarenûsa wî ne diyar e.

Birêz **Bavê Şino,** ku bi temenê xwe derdora şêst salî ye, wî piraniya salên xwe di kar û xebata kurdewariyê de borandiye û ji bo doza gelê xwe ya dadmend û rewa xebateke bê hempa kiriye, weke kesayetiyeke rastgo, wêrek û dilsoz di nav xelkê de hatiye naskirin.

Ji roja ku wî dest bi xebata rêzanî kiriye, her û her wî berjewendiya welatê xwe Sûriyê û ya gelê wê bi tevayî parastiye, xebateke îjdil û bê dudilî ji bo parastin û pêşvebirina biratiya Kurd û Ereban pêşkêş kiriye. Di heman demê de, wî li zindan û li derveyî zindanê jî, pêdariyeke berbiçav li hemberî siyaseta şoven a karbidestên dewletê û pilanên wê yên nijadperest ên ne mirovane kirye û ji xelkên xwe re bûye nimûneyeke balkêş. Çavên wî ji çoyê dewletê ne şikestiye û wî destberdayî li derd û kulên gelê xwe temaşe ne kiriye û pişta xwe ne daye êşekên wî. Lê belê, di her roleke erênî de, di warê geşkirina xebata demokratîk a aştiyane de hebû ye.

Birêz **Bavê Şino**, mirovekî xwedî bawerî û geşbîn e. Tevî rewşa awarte ya tevgera me ya netewî, rojekê ew ji kar û xebata kurdewariyê bê hêvî ne bûye, Herdem, di rojên reş û tariyê de, di rojên teng û çavsoriyê de, wî pêdarî kiriye, di nav keç û xortên Kurdan de, moralên wan bilind kiriye, hêvî û baweriya bi dozê di dil û hişê wan de çandiye û berî her kesî, wî qurbanî daniye. Di vî warî de, tê bîra min wî di civateke rewşenbîran de, bi vê wateyê gotibû:" Di jiyana xwe de, rojeke bi tenê jî ez li xebata xwe poşman nebûme, ji kar û xebata kurdewariyê bê hêvî nebûme, û min ji hevalekî xwe re gotiye, hevalo, eger ez mirim, û rojekê hûn hatin ser gora min û ji bo vê doza pîroz karekî ji min bixwazin, ezê serê xwe hildim, axa gorê biqelêşim û rabim ser piyên xwe û wî karî ji bo gelê xwe bikim!!"

Girtin û binçavkirina mirovên mîna têkoşer û xebatkar **Bavê Şino**, pirsa Kurdî li Sûriyê çareser nake, ne tenê wilo, ew çavên gelê me yê qehreman jî naşikîne,û vîna wî ji bo misogerkirina mafên wî yên netewî naçilmisîne.

Di baweriya min de, girtina birêz **Bavê Şino** û hemî xebatkarên Kurd û niştimanperwerên Sûriyê, nakeve rajeya bilind a welatê me. Giringe ku karbidestên dewletê li xwe vegerin, çavên xwe li guhertinên dunyayê vekin, ka bê çi li derdora wan dibe û çi nabe, dewletên dinê bi çi awî têkiliyê bi gelên xwe re dikin, daku ew jî dev ji kiryarên xwe berdin, lêborînê ji gelê xwe bixwazin û bi diyalogê pirsan çareser bikin.

Hêviya min ew e ku birêz **Bavê Şino** digel hemî girtiyên siyasî yên Sûriyê bêtin berdan û ew hemî jiyana xwe ya normal bijîn.

Heleb 25.10.2009 Z

www.arsivakurdi.org

# Kurd Li Sûriyê Nejadperestiyek Çewsandineke Bêhtir Zêdetir,

Cotyar Murad

Di 5ê meha Çiriya Pêşîn de, çil û heft sal bi ser serjimêriya awarte derbas bû ku li Parêzgeha Hisiçe ku piraniya wê Kurd in, hat encamdan, bi bihaneya naskirina Kurdên Sûriyê ji yên ne Sûriyê, ew serjimêriya çepel li gor biryara hijmar /93/ ya 23'ê Tebaxa 1962'an de hat cîbicîkirin û di mada yekê de hatiye: "Pêwîst e di yek rojê de serjimêriyeke giştî ji bo xelkên parêzgeha Hisiçe bihê cîbicîkirin û dema wê jî bi pêşniyazeke Wezîrê Karên Hundir û bi biryara Wezîrê Pilandanînê bihê diyarkirin" û wek hatibû danîn, ew serjimêriya ku jêdera xwe ji lojîk û hizrekî şovînîsît distîne, di 5'ê Çiriya Pêşîn a 1962'an de cîbicî kirin, û li gor statîstîkan, regeznameya bi dehan hezar Kurd bê tu sedemekê ji wan hat standin, ji bilî ku ew Kurd in, û di encama serjimêriyê de gelê Kurd li Sûriya li ser sê beşan hat parçekirin: 1- Kurdên xwedan regeznameya Sûriyê. 2- Kurdên ku regeznameya wan ji wan hat stndin, û di qeydên fermî de bi navê"biyanyên Hisiçe" hatin nivîsandin, û karteke sor a venasînî dan wan û nikarin paseport der bixin yan ji sînorê Sûriyê derkevin, û ne tenê ev, heta nikarin di otêlan de jî binivin, tevî ku piştî xwendina xwe di peymangeh û zanîngehan de temam bikin, nikarin di karên hikûmetî de bibin karmend. 3- Kurdên ku regeznama wan ji wan hat standin, lê di qeydên fermî de bi yekcarî nehatine tomarkirin, û ew jî bi "mektom" tên naskirin, û hebûna wan bi karteke zer tê cudakirin, û tu dukomênt yan belgeyên fermî bi wan re tune, ji bilî bawernama venasînê ku ji ba muxtar derdikeve yan senedê rûniştinê, ev kes jî ji hemû mafên welatîbûne bêpar in û nikarin xwendina xwe di zanîngeh û peymangehan de berdewam bikin yan bawernama bekeloriya bistînin.

Ji wê demê ve, û di encama wê pirojeya nejadperest de, ew beşê gelê Kurd (kesên regezname ji wan hat standin û kesên veşartî ku hejmara wan niha ji 300 hezar kesî zêdetir e) ji hemû curên cudakirinê dinalin û ji hemû mafên siyasî, aborî, civakî û rewşenbîrî û herwiha ji mafê çavdêriya tendirustî, ku hinek nexweşxaneyên leşkerî û hukumî pêşwaziya wan nakin mîna (nexweşxaneya leşkerî ya Tişrîn, nexweşxaneya Esed), ev hemû ji xaynî ku nabe bibin xwediyê zeviyên çandinê yan xaniyan.

Herwiha ji hemû mafên welatîbûnê jî bêpar bûne, û ji bo wan tuneye hevjîn û zarokên xwe li ser navên xwe tomar bikin. Piştî ku Partiya Bees desthilat li Sûriyê girte destê xwe û rewşa awarte di 8ê Adara1963an ragihand ku heta niha berdewam e, li cihê ku bandor û encamên serjimêriya awarte rast bike, bi armanca jinavbirin û tunekirina gelê Kurd li Sûriyê, hikûmeta Bees siyaset û karên hikûmetên berê berdewam kirin, bi rêya sipartina Mihemed Teleb Hîlal (ku di wê demê de berpirsê ewlekariya siyasî bû li deverê) ji bo amadekirina dîraseyekê tevahî li ser parêzgeha Hisiçe, bi merema zanîna rê û awa û çawaniya jinavbirina hebûna Kurdan li deverê û windakirina wî di nav netewa Erebî de Belê Mihemed Teleb Hîlal ev yek bi cih anî û nirxandineke berfireh li ser parêzgha Hisiçe pêşkêş kir û têda Kurd bi gelekî bê şaristanyet, ziman û bê dîrok pesn kir û têda got jî, Kurd tenê xwedan tundûtûjî û hovîtiyê ne û ev jî rûniştvanên çiya ji yên din cuda dike, ew nirxandina Hîlal ji 12 pêşniyaran pêk hatibû û têda awayê jinavbirin û tunekirin hebûna Kurdan li deverê şirove kiribû, bi rêya: 1- Koçkirina hundir (bi rêya veguhastina rûniştvanan re). 2- Belavkirina nezanîn û tênegihîştinê,

D.R. ( 7 )

www.arsivakurd.org

bi rêya bêparkirina Kurdan ji mafê fêrbûnê. 3- Girtina deriyê karkirinê û bêparkirina wî ji alîkariyê. 4- Derxistina her kesekî regeznameya wî nehatibe îsbatkirin û wan bidin destê welatên hawîrdor. 5- Tûjkirina Kurdan li dijî hev. 6- Anîna regezên Ereb û neteweperest û bicihkirina wan li deverên Kurdan li ser sînor. 7- Kesên ku dixwazin li wê deverê bimînin û regeznameya wan ya resen her çi be, nabe regeznameya Sûriyê bistînin (ji bilî Ereban). 8- Divê hêla bakûr ya devera Cezîrê bibe devereke leşkerî, bi rengekî kertên leşkerî têde bicih bikin û karê wan bicihkirina Ereban, û dûrxistina Kurdan be, li gor pilana ku dewlet wê deyîne. 9- Bêparkirina her kesekî ku nizane zimanê Erebî ji mafên wî yên siyasî. 10- Rêxistina hewekê di nav rêzêm Ereban de ji bo dijberîkirina Kurdan. 11- Avakirina bexçeyên (mezrayên) bi komel ji bo Erebên ku dewlet dê wan li hêla bakûr bi cih bike, lê divê ew bexçe pir be ji leşkeran û pir çek be, mîna deverên bin destên Cihûyan li ser sînor. 12- Rakirina sîfeta olî ji ser oldarên Kurd, yan veguhastina wan ji bo deverên din, bi rêya şandina oldarên Ereb ji bo deverên Kurdan. Di roja 24ê Hezîrana 1974an de û li ser biryareke serkirdatiya Partiya Bees, cîbicîkirina proja zinara Erebî destpê kir bi armanca cudakirina Kurdên li Sûriyê ji birayên xwe li Tirkiye û Îraqê, bi rêya avakirina 42 komelgehên rûniştbûne ji bo erebên ku ji herdu parêzgehên Heleb û Reqe anîne, herwiha belavkirina 800 hezar donim erd ji zeviyên ku ji xelkê 335 gundên Kurd li devera Cezîrê hatine standin, bi dirêjahiya 375 km û paniya 10-15 km, û ev bû encama cîbicîkirina proja zinara erebî û ew zevî dûre bi bexçeyên dewletê hatin binavkirin. Bi vê gava qirêj, hikûmeta Bees bi hezaran malbatên Kurd ji zeviyên wan bêpar kirin ku mîratên bav û bapîrên wan bû û bi tenê çavkaniya risqê wan bû, û bû sedema koçkirin û barkirina wan malbatan bo gund û deverên li derdora bajarên mezin mîna Dîmeşqa paytext, daku li pey risqê xwe bigerin, û herwiha bû sedema koçkirina hinê din ji bo derveyî Sûriyê. Bi vî awayî jî hikûmeta Bees di guhertina cuxrafiya deverê û demografiyeta wê de serket bi rêya bikaranîna hemû alav û rê û şûnên şovînî û nejadperstî ku armanca wan bi tevahî valakirina deverê ji Kurdan bû. Ji wê demê ve û heta niha, desthilatên Sûriyê hîn li ser cîbicîkirina siyasetên şovînî û pirojeyên nejadperestî bo tunekirina Kurdan bi hemû rêyan û di hemû waran de berdewam in. Di berdewamiya siyasetên şovînî de, desthilatên Sûriyê, di 10ê Îlona 2008an de biryara hejmar 49 derxist, ku bandora wê wek tepeke mezin bû li serê xelkê deverê bi giştî û li serê Kurdan bi taybet ket, di naveroka biryara de hatiye: "Nabe her zevî ya aqareke deverên sînorî bihê veguhastin ya guhertin ya standin yan bikar bînin ji bo berhemanîn yan kirêdanê, bê ku moleta berwext bistîne". Bi têgihiştinek din "Kurd nikarin bibin xwediyên zeviyan, eger razîbûna dezgehên ewlekariyê nestînin". Bi sedema vê biryarê jî xebat û karên aborî li deverê hatin rawestandin û rêjeya bêkarî û betaliyê bilindtir bû û di encam de hejarî zêdetir bû, helbet armanca biryarê dorpêçkirin û girêdana welatiyên Kurd e li parêzgeha Hisiçe û deverê din yên Kurdan, û nîşanek eşkere û diyar bû ji bo berdewamya siyasetên şovînî yên desthilatê li hember gelê me yê Kurd li Sûriyê, û herwiha li dijî hemû peyman û rêkeftinên navdewletî yên mafê mirovan e, û tiştê herî zêdetir ku binpêkirineke eşkere ye ji bo destûra Sûriyê. Îro jî û piştî derbasbûna 47 salan li ser serjimêriya awarte û piroje û biryarên din yên nejadperest di derheqê gelê me yê Kurd de li Sûriyê, û tevî wan sozên ku her car berpirs didin, û li serveyî wan hemûyan serokomar, ji bo dîtina çareseriyekê ji bo wê pirsgirêkê, lê hîn desthilat berdewam e li ser piştguhxistina kesên regeznameya wan ji wan hat standin, û herwiha li ser aqliyeta xwe ya **D. R ( 11 )**

www.arsivakurdi.org

# Di roja cîhanî ya mafên zarokan de, rewsa zarokên Kurd li Sûriyê

Lava Derwêş

***Hemû mafên peymanê ji hemû zarokan re (bend 2 peymana mafê zarokan)***

Zarok li Şûriye nakevin ber vê peymanê de, tevî ko Sûriye ew pêbawerdan daye û di zagona xwe ya neteweyî de bi cih kiriye. Ew jî weke gelek peymanên dî yên mirovan li welatên tirs û qedexekirinan, deqek li ser kaxezê ye.

Mijara binpêkirin û paşguhkirina desthelatê ji mafê zarokan re gerekî lêkolînên berfireh e, di vê nivîsa xwe de dixwazim bi taybet behsa mafê zarokên Kurd bikim û bêparkirina wan ji biçûktirîn û giringtirîn maf .

Mafê jiyanê, nav, nasname, azadiya derbirînê, xwendin, perwerde, parastina ji işkencê, ji tund û tûjiyê....

Ev hêmanên avakrina mirovekî saxlem in ku karibe di paşerojê civakeke dadmend û azad ava bike yan hevparê avakirina wê be. Zarokên Kurd ji dema jidayik dibin ji van mafan bêpar in. Bar û êşên ji xwe mezintir hildigirin.

Bê nav in, bê nasname ne, tên girtin ji ber ew Kurd in. Ji hêla dezgehên dewletê, yên ku erkê wa ye wan biparêze, şêweyê hovane yê işkencê li wan dikin. Dezgehên perwedeya yekalî, cudahiyê dixin nav wan de, herwha ji dev dibistanan berdidin an têne avêtin.

***Her zarokek ji mafê wê/wî ye, yekser piştî jidayikbûnê were qeydkirin, navlêkirin hemwelatiyê bistîne ( benda 7)*** Di çarçewa siyaseteke şofinîst de li Sûriye ku dijî Kurdan e, di 5/10/1962 de li herêma Kurdan, li Cezîrê, serjimara awarte hate pêkanîn. Di encamê de nêzîkî 150.000 Kurd nasnameyên Sûrî ji wan hatin standin û ji mafê hemwelatiyê bêpar man. Heta roja îro bi berdewamî ev encam xwe dubare dike. Lewre bênasnameya Kurdan ji dê û bav yekser dighe zarokan.

Gelek astengî di qeydkirina zarokê de derdikevin. Ev astengî bi xwestina erêniya ewlekariyê dest pê dike heta ber dergehê dadgehê. Gava dê hemwelatî be û bav ”biyanî be ango bê nasname be, zarokên wan) (mektûm in û nayên qeydkirin.



Ji hêla nav ve, ne ji mafê zaroka ye ko navekî Kurdî hilgire yan pê were qeydkirin.

***Li welatên kêmneteweyên etnîk lê hebin, divê zaroka ne ji neteweya yekem be, bêpar nemîne ji perwedeya kultura xwe û zimanê dayikê. (Benda 30)***

Kurd di Sûriyê de neteweya duyem e. Rajeya hejmara Kurdan li Sûrî nêzîka 13-15 % e ji hejmara nişteciyan û ew li ser xaka xwe ya dîrokî ne. Lê nikarin bi zimanê xwe biaxivin û perwerde bibin .

Bi sala ye ku ramyariya erebkirina herêmên Kurdî berdewam e. Di systema perwerdekirin û dibistanan de nabe zarok ji bilî zimanê erebî bipeyivîn.

Benda 37an ji peymanê işkence û girtina bi zorê yan ne ser bingeheke zagonî qedexe dike.

Li gor raportên dezgeha lêborînê ya navnetewî Sûriye ti rêzê li vê bendê nagire. Hemû şêweyên işkencê li zarokên Kurd yên di zindanan de dibin.

Hêjayî gotinê ye ku di sala 2005an de, di roja zarokan ya cîhanî de, hêzên ewlekairyê êrişî zarokên Kurd kirin. Ew zarokên ko bi gurzên gulan û gazinên xwe ji ne pêkanîna bendên peymana mafên zarokan, li ber navenda neteweyên yekbûyî xwepêşandanek lidar xistin.

Ji aliyekî dî ve zarokên karker yên li kolanan û bin mercên zor de kar dikin li Sûriyê bi giştî hene, lê ji ber rewşa awarte ya li ser Kurdan, hejmara zarokên karker yên Kurd bi gelekî bihtir e. Ew di karên ne yaseyî û yên metirsiyê de dixebitin û li kolanan dijîn. Bi gotinekê, zaroktî li welatê qedexekirinan qedexe ye. Û bi destnîşandineke taybet li Sûriyê tu rêz ji mafê zarokên Kurd re nayê giritin. **Ji malpera Avesta**

www.arsivakurdi.org

# Infiliwenza berazan ( xenzîran )

**Memê Alan**

Ev nexweşiya , nexweşiyeke dîrokî ye , cara yekê , sala 1918-1919 an li Ispaniya peyda bû . Di encam de , bi milyonan mirov bi vê nexweşiyê ketin , û ji wan bêtirî milyonekê mirin . Wêlomê wê hîngê , ew bi infilewenza Ispanî bi nav bû . Herweha li sala 1958an , ew li Rûsiya bi nav xelkê wir ket , paşê dîsa li wir , sala 1974an belav bû , û bi Infiliwenza Rûsî hate navdan . Hêjaye em wînin zimên , ku veyrûsa vê nexweşiyê , ji berazan derbasî nav mirovan dibe . Wêlomê jî ew bi Infilewenza berazan tête binavkirin. Nîşanên vê nexweşiyê , pir nêzîkî nîşanên sermagirtinê ye . Mirovê ku bi infilewenza berazan ketibe , empişkê wî hiltên , dikuxe , germ dibe ( nîşaneke bingehî ye ) , av ji çav û pozê wî diherike , û gewriya wî ziwa dibe û dişewite . Le tuştê vê rengî ji infiliwenzên dî cuda dike ku nîşanên xwe hêzbilindin û li rex nîşanên borî , nîşanin din hundurî di made û rovikên mirovan de çêdibin , mîna : Made lihevketin , vereşandin , navçûn û zikêşê . Û ew bi vegirtinê ji mirovekî dere mirovekî dî , yanê di riya têkildariyê ( kontektê ) re . vêca xwejêparastin û tenduristkirina ji vê nexweşiyê , berî hertiştî bi xwepaqijiyê , û li kêlek wê dûrketina mirov ji wan kesên bi veyrûsa vê nexweşiyê ketine ye . Yanê mirovê ku pêhesî , ku nîşanên vê nexweşiyê li ba wî peyda dibin , pêwîste weha bike .

1-Xwe ji kesên derdora xwe bi dûr xwe , ta ku , tukesî din jê venegire .

2-Xwe vehesîne ( rihet bike ) , ji ber ku kesê bi vê nexweşiyê , vehes pê gereke .

3-Pêwîste laşê wî , dest , û alavên pê dixwe û vedixwe , an jî bi kar tînê baş bi hin dermanên paqijiyê herdem bêne paqijkirin .

4-Pût û pêdan bi xwarin û vexwarina wî bê kirin . Divê ew bêtir zorê di xwarina xwe de bide tiştên ron û fêkiyan . Yanê her xwarinên ku berevaniya wî li dij wê nexweşiyê zêde dike

Li dawiyê ev nexweşiya normal û ne pir bive ye , ger mirov zana û têgihiştiyê wê be .

# Kewîs Axa Kî Ye?.

Wês kurê Ehmedê Cemîlê Kanebî, ji êla Herkiyan e. Di sala 1889 an de, li zozana Çarelê ji dayîk bû ye. Kewîs Axa riya bavê xwe digre û dibe şivanê pêz. Di ber şivantiyê re, di navbera deştên Rojhilatî Mûsil û zoznana de, hunera wî bilind dibe.

Di dehsaliya wî de ,bav dimre, diya wî Leyla goçeberî gundê meta wî- Hekariya Soran – dibe. Li wir dê jî dimre. Pişrî mirina dê, dibe şivanê pezê Ehmed Xanê Herkî. Bi mirina bav û diya xwe pir dêşe , û êşa xwe di stranan de diherkîne. Di sala1915 an de, dev ji şivantiyê berdide û dest bi dengbêjiyê dike û li Rawendizê, li ba Hecî Newrozê Bawel Axa bi cîwar dibe û li wir dibe denbêjê dîwanxanan. Piştî Rawendizê, di sala 1916 an de, ji hêla Rûsan ve tê dagîr û şewitandin, û bi axayê xwe re, penabrî Şeqlawa dibe .Di dema Osmaniyan de, axê wî dibe fermandêrê Şeqlawa û ew jî dibe berpirsiyarê embara xwerinê. Kewîs Axa, hin ji xwerina leşkeran bi dizî dide xelkê wê deverê yên hejar. Li Şeqlawa keça Mehmûd Şerîfî dixweze û çar zarokan tîne, Ehmed, Mihemed, Ebdela û Cemîl. Piştî demekê berê xwe dide Hewlêrê û li wir ne tenê di dîwanên axan de , belê , di Çayxana Elî Felehî de stranan dibêje .Di sala 1930î de, diçe Bexdadê û li wir hin stranên xwe tomar dike. Kewîs Axa li Bakur, Başûr û rojhilatî Kurdistanê geryaye û ew çend caran çûye ba Şêx Mehmûd Hefîd û Ismaîl Axayê Şikakî û stran li ser wan gotine.

Kewîs Axa di sibata 1936 an de, diçe serdana mirovên xwe yên li devera Pîrmamê û li gundê Herşemê nexweş dibe û li wir goç bardike.Û xanima wî, di sala 1982 an de ji dunyayê bardike.

Kewîs Axa stran wek ava çemê Çetelê ji devê wî diherikîn, û ew ji dengbêjên herî navdar yên Kurdistanê bû.

Stranên Kewîs Axa yên herî navdar : Gênc Xelîl , Melîko , Şêx Mehmûd , Ismaîl Axa . De Xalo, Lo,Lo Peyayo, Çemê Çetelê , Delal, Bêrîvanê , Sevgan , Dotmam û Narê Hey Nar.

Hêjayî gotinê ye ku, di 22-11/ 1999 an de, şalyarê rewşenbîrî yê Kurdistanê, birêz Felakedîn Kakeyî , li bajarê Şeqlawa perde ji ser peykerê Kewîs Axa rakir.

www.arsivakurdi.org

# Hevpeyvîn: Bi Hevjîna Dr. Qasimlo Re

**Rehîm Reşîdî**

**Rojnamevanê hêja û xwedî şiyan, Rehîm Reşîdî ji bo min telefon kir û got ku rojnameya "Kurdistan"ê û duheftînameya Agirî dixwazin di yad û bîranîna 20'mîn salvegera terora Viyenê de hevpeyvînekê bi we re çê bikin...**
Pirsiyar ji bo min xwendin û min jî daxwaz qebûl kir û bi vî awayî bersiva pirsan didim.



Berî her tiştî dixwazim bibêjim ku "Kurdistan" û Agirî di xebata rojnamevaniya kurdî û tekoşîna şoreşgerane de heya niha rolek çalak, ektîv û cihê hurmetê di Kurdistana Îranê de lîstine. Ez hêvî dikim bi kar û tekoşîna nivîskarên niha ku bi gotina Reşîdî piraniya wan ciwanên bi şiyan û keddar in, pitir geşe bike û her pêşde biçe. Berê jî min gotiye ku min bîranînên zaf tevî "Kurdistanê" de hene. Wê dema ku ez bi qaçaxî li Tehranê dijiyam, min di çap û belavkirina wê de hevkariya Dr. Qasimlo dikir. Xwezî ji wan rojan ku rêya jiyana min bo hertimî bi kurd û xebata mafxwazane ya kurdan ve girê da û dê heta dawîn nefesa xwe jî her wefadar bi kurd û armancên kurdan bimînim. Ez bêguman im ku ev netewe dê ser bikeve.
Pirs: 20 sal bi ser Şehîdkirina rêberê mezin yê gelê kurd derbas dibe û roj li pey rojê rêbaza Dr. Qasimlo xurtir dibe û evîndar, rêvîng û xebatkarên wê zêdetir li dora wê rêbazê kom dibin. Te weke hevsera wefadar ya Dr. Qasimlo, piştî borîna van 20 salane çi hestek heye? Gelo hûn li ser vê beweriyê ne ku bîr û hizrên Dr. Qasimlo zêdetir ji serkevtinê nêzîk bûne?.

Nesrîn Qasimlo: Eva ku ew teror di civakek demokratîk de birêve çû û eva ku edalet û dadperwerî birêve neçû, ez 20 sal e ku hest bi nerehetî û nigeraniyê dikim, ji wan kesan nerihet im ku xwîna rêberên kurdan kirine goriyê qazanc û berjewendiyên aborî. Bîr û hizrên Dr. Qasimlo, mirovdostane û demokrasîxwazane bûn. Îro ne tenê Kurdistan, belkî gelên din yên Îranê û azadîxwazên wî welatî jî weke Dr. Qasimlo difikirin. Lewra serkevtin her ji bo wê rêbazê ye. Kurd ger bi başî ew mîratên ku Dr. Qasimlo ji wan re bicî hiştiye bînin cîh, serkevtin misoger e û tu zordarek nikare pêşiya serkevtina wan bigre.

**Pirs**: Di 22'ê Pûşpera çend salên derbasbûyî de û bi taybet ji sala 1384'ê Rojî (2005) virdetir, civatên xelkê Kurdistanê hemû salekê yekdeng û bi yekhelwest bi daxistina dukan û bazaran û temirandina çirayên malan û çend şêweyên din, yad û bîranîna Dr. Qasimlo bilind dinirxînin û cinayeta Komara Îslamî mehkûm û şermezar dikin. Bi raya we ew terze helwestane ku her sal berîntir û berfirehtir
birêve diçin, heya çiqas bandor û karîgerî heye?

Nesrîn Qasimlo: Karîgerî û bandora van terze bizavane zaf e û ez keyfxweş im ku neteweya kurd rêbaza rêberên xwe wunda nekiriye û bi her awayekê ku ji wan re dilive, yad û bîranîna wan birêz û bilind dinirxînin. Eva jî baştirîn mînak e ku kurd şerxwaz û xwînrêj nebûye û nine. Xebatek serkevtî ger bi nirxek kêmtir jî ser bigre, pirr baştir e.

Di vê derheqê de ez pîrozbahiyê **D.R ( 11 )**

www.arsivakurdi.org

**Dumahîk: Hevbeyvîn…**

ji neteweya kurd û birêveberên vê xebatê dikim û bi germî destê wan diguvişim.
Pirs: Xelkê Kurdistanê zêdetir dixwazin li ser kesayetiya Dr. Qasimlo bizanin. Gelo riftar û xebata şoreşvaniya Dr. Qasimlo rengvedan li ser jiyana rojane ya şehîdê nemir hebû yan na?
Nesrîn Qasimlo: Bêguman, kar û kiryarên Dr. Qasimlo hev digirtin. Ew her bi qise demokrat nebû, ji ber ku bi kiryar jî diselimand ku demokrat e û encamên demokrasiyê jî dipejirand. Wî ji bo modernîzekirina xebata Kurd û PDK'ê, hewleke zaf da. Karîgerî û bandora Qasimlo li ser xebata millî- demokratîk a Kurd li riftar û livîna demokratane û baweriya kûr a wî bi demokrasiyê çavkanî digirt.
Pirs: We sala borî bi hevkariya komîta PDKÎ serdana Amerîkayê kir û di çendîn civînên girîng di astek bilind de hûn li ser dosya Dr. Qasimlo axivîn. Em dikarin bizanibin ku we çi bersivek stand? Gelo li wê seferê di pêxema dûketina dosyaya Dr. Qasimlo de we çi piştevanî bidest xist?
Nesrîn Qasimlo: Di rastî de li Senaya Amerîkayê, ez gazî kirim. Min ji wan pirs kir ku gelo belgeyên hewce ji bo dubare ve bûna perwendeya Viyenê hene? Çunku dewleta Otrîşê heya niha jî amade nîne di vê derheqê de çi gavekê bavêje. Ew teror zêdetir bûye goriyê dan û standinên bazirganî. Hûn dizanin ku hukûmeta wê demê ya Otrîşê sîlah û çek û cebilxane bi Îraq û Îranê firotibûn.
Di halekê de ku wî welatî weke welatek bêalî di şerê navbera Îran û Îraqê de, mafê vê yekê nebû ku wî karî bike. Lewra pirr ditirsiyan ku di rewşa wê demê de ew tişt eşkere bibe. Lê ez bêguman im ku ew dosya dê bikeve kar û edalet û dadperwerî jî cîbicî bibe. Ji ber wê jî hin kes hene ku bo cîbicîbûn û birêveçûna edalet û vê dadperweriyê xebat û tekoşînê dimeşînin. Bila ez jî vê yekê bi çavên xwe nebînim, lê eva jî rastiyek e û heta ser veşartî namîne.
Pirs: Xelkê Kurdistanê we bi dayîka Kurdan nas dikin û rêz û hurmetek taybetî ji bo we hene. Peyama we ji bo xelkê di pêvajoya xebata berheq a gelê me de çiye?
Nesrîn Qasimlo: Gava ez guhdariya van peyvan dikim, dilê min dihele. Min karek wisa bo Kurdan nekiriye ku hêjayî ew hemû rêz û hurmetê bim. Lê tim dilê min tevî wan û xebata wan e. Ez dizanim ku ew, hêja û jêhatiyê jiyanek serdemiyane ne. Hêviya min ew e ku di domandina xebat ji bo rizgariyê de berdewam bin û ez bawer im ku hûn dê serkevin. Hêviya min, ev e ku qet rê û rêbaza Qasimlo ber nedin, bona wê ku evîn û hurmeta wan bo xelkê û xaka wan kêm nebe. Kurd divêt bizanin ku ew jêhatî azadî û serbestiyê weke gellek neteweyên din yên vê cîhanê ne. Mafê Kurdan e ku ji bo gihîştin bi jiyanek baştir serbarê hemû çewisandin û tepeseriyekê, xebata rewa û berheq ya xwe bidomînin. Di vê xebatê de ez tim digel wan de me û serkevtinê ji wan re bi hêvî dixwazim.

**Ji malpera PDKÎran**

**Dumahîk : Kurd Li Sûriyê**

ewlekkarî berdewam e ji bo riftarkirin digel doza Kurdan li Sûriyê, bi rêya cîbicîkirina siyaseta girtinê li hember gelê Kurd û tevgera wî ya siyasî jî ya ku serkirdeyên wê niha bûne armanca desthilatê, wek girtina endamên desteka serkirdayetiya Partiya Azadî ( Mistefa Coma, Sedûn Şêxo, Mihemed Daîd Umer) û peyvdarê
Şepela Paşeroja Kurd (Mişel Temo) û çend rêberên dî yên partiyên Kurd li Sûriyê.

**Ji Kovara Agirî Hejmar 121**

www.arsivakurdi.org

**Dumahîk** : **Destlat û…**

û rê ji gendeleyê re jî fereh û kûrtir bike. Ji ber wê yekê jî, cîhan tev dizane, ku li hemî dewletan libergirtina gendeleyê, ji koka xwe de, ne ustubariya dezgehên asayişê ye, li bervajî wê, belkî ew hîmek in ji sedemên wê û rola wan di pirsên wek wê de pir gumandar e û diyar e, loma jî gereke asayiş destê xwe ji mijarê bikşîne, bi dezgehên zagonî ve were girêdan û bibe karê dadgehan.


Lê tiştên herî bingehîn, divê azadî û demkrasî peyda bibe, saziyên komelgeha sîvîl û partiyên siyasî serbest û bi şêweyekî zagonî bixebitin û rola xwe bistînin. Eger dixwaziyeke îjdil bi çareserkirina pirsa gendeleyê heye, divê ev hemî war, ligel serbestkirina ragihandinê, werin zelalkirin û azadkirin, ji bilî vê rêkê û wan pêdviyên pêwîst, çi gotin û çi kar ji bo çareserkirina gendeleyê û gelek pirsgirêkên dewlete û civaka Sûrî werin kirin yan gotin, dê bê encam bin û dê bibe ji rengê: «şorên pir.. bayê kur!!».

Baş xuya ye, ku ta roja îro, destlat li çareseriyên kokane û birdar ji pirsgirêka gendeleyê re negere, ew dixwaze di riya asayişên xwe re xwe nêzîk wê pirsa giring bike. Lê pirseke wek wê mezin ku gelek caran dawiya dewletan aniye, bi karên biçûk û rast û rewa çareser nabe, ew ne riya çareseriyê ye, ji ber em tev dizanin ku sedema gendeleyê ya bingehîn, ne di kesayetiya karmendan de ye, ew li rêza pêşîn di zagon û çawahiya destlatê û mejiyê rêberên wê de ye. Wek tê gotin masî ji serî de digemire, destlat û sazûman jî ji hiş, raman, siayset û biryarên ne durust de digemirin û gendele dibin.

Loma jî pakirin û malana dewletan jî, mina ya pêplûkan e, ji jêr de natên şuştin, ew jî ji pêplûka tewir jor de tê şuştin, yan jî hîç pak nebe.

Birastî, dilê mirovê Sûrî pir dişwite, dema dibîse ku navê welatê wî di warê gendeleyê de, di nav pileyên herî xirab de ye li cîhanê. Bêguman, ji vê rewşa xirab de, sazûman û destlat berpirsiyar û gunehbar e.

# Nameyeka sersaxiyê



**Li** xerîbiyê , 7-ê Çiriya paşîn 2009 an , di nexweşxaneke Stokholmê – Swêd , di bin kartêkirina bûyereke bi êş de , dilê têkoşerê Kurd ê navdar ê ku bi navê **kek Lezgîn** dihate naskirin , **Zeyn - Elabidîn Ozalp (Şêx Zeynî)** rawestiya û ji vê dunyayê koç barkir .

Rojnameyên Swêdî û hinde malperên bi zimanê kurdî , bi êş û mixwabinî , nûçe dane belavkirin . Li nusêbîn , Cizîr , Diyarbekir û seranserî Kurdistanê , digel rewşenbîr û siyasetvanên Kurd ên ku li Swêd û Awropa dijîn deng vedabû û ciyê berketîbûna xelkê bû.

Lezgîn ( Şêx Zeynî ) bi dil û can li dirêjahiya nêzî Çil salî ji temenê xwe , di têkoşîna li beramber nijadperestiyê û siyaseta înkarkirina hebûna gelê Kurd de dixebitî û li ber xwe dida . Û ji bona pirsa demokrasiyê , mafên mirovan , azadî û wekheviya gelan , çalakvanekî dilsoz , xwedî nêrîn û helwest bû . Di girtîgehan de û li hember dadgehên Turkiyê , bi serbilindî û bê dudilî , li zimanê xwe yê dê dibû xwedî , mirovekî mirovhez bû

**Bila serê dost û hevalên Şêx Zeynî sax be , xwedî , meriv û malbata rehmetî xweş bin . Çûna kek Lezgîn - Şêx Zeynî – xisara me hemiyan bû .**

**Nivîsgeha rêzanî ya**
**Parta Yekîtî ya demokrat a Kurd li Sûriyê( Yekîtî )**

**9.11.2009**

www.arsivakurdi.org

# Destlat û Çareserkirina Gendeleyê
## ((Şorên pir bayê kur !?))

**Rozad Elî**

Dema ku tiştek kufkî dibe, digemire û bi kêrî daxwaz û pêdviyan netê, jê re dibêjin bûye gemiriye, yan gendele bûye.

Gendelebûn di gelek waran de peda dibe. Di xwarin û vexwarinê de û ra di gelek war û endamên sirûşt û jîngehê de jî çê dibe.

Gendele ne di tiştên şênber de tenê çê dibe, ew di warên razberî de jî peyda dibe, li wir jî giran dibe û kavliyê bi xwe re tine. Gendele di hiş û sinciyên mirov û kirinên wîû û elek warên komelgê de jî peyda dibe.

Netenê wilo, gelek caran çembera gendeleyê fereh dibe, û dikeve binyata dewletan jî, û hemî sazî damezraw û binyata wê digre, dide ber û kavil dike.

Pend Kurdî ya kevin dibêje «Av di golan de bimîne digemire», sedemeke gendeleyê ye bingehîn diyar û rave dike. Ew xuya dike û dibêje, ku eger tiştek, çi be, demeke dirêj di cihê xwe de, di rewşeke bê nûbûn û paqijkirin de bimîne, ta ava zelal be jî, dîsa digemire, bê sûd dibe, na belê ziyanê û ra mirinê jî li hawîrdorê peyda dike.

Li Sûryayê, ji salên pir dirêj de, partî û rêxistinên siyasî yên li derveyî sazûmanê û hinek ji yên hundurê wê jî, çêre gendeleya pirewarî ku di nava sazûmanê de, û li ba pêşber û berpirsên destlatên (nimûne jî pir in), û di hemî movikên dewletê de hene, dibin. Lê destlata yekpartî û yek nêrîn, ew rastiyên beloq înkar dikir û dikir ku nabîne û paşguh dikir. Sazûmanê rê li ber baweriyên gel û gotinên wan partiyan dibirî, devê wan bi hemî şêweyan digirt. Ji xwe wê hemî alavên ragihandinê jî xistine destê xwe, û pê ser rastiyan dipêçe, û ser gendelebûna sazûmanê û destlata xwe digire û rûyê dewletê û destlat xwe sipî dide xuyan û wê serkeftî diyar kir.

Lê belê, «Rum di tûran de netên veşartin», gendelebûn jî bi lêmikûrnehatin, çêrênebûn û sergirtinê netê veşartin û netê çareserkirin jî. Çinkî çiqas ser rûyê tişt yan warên ku gendelebûne were pêçan û fodilkirin, nemaze jî eger bi meziniyê gendeleya destlatê be, ew hîç nayê veşartin, ji ber ku bîna wê derketiye û li hemî hawîrdoran belav dibe.

Di van rewşan de, û piştî ku gendelebûnê di hemî warên dewlet û destlatê de konik girt û ew bêxêr kirin, komelgeha Sûrî jandar kir û hin bi hin ew jî têk diçe, hênû destlat pir bi fedî çêre gendeleyê û çareserkirina wê dibe, wekî ku ew pirs hê nû peyda bûye, yan jî ji derveyî welêt ji me re hatiye, yan jî ji hêla xêrnexwazan de hatibe şandine!?

Lê tiştê herî mitêl ew e ku dewlet «kerê berdide dere kurtên», ango ew li sedem, jêder çavkaniyên gendeleyê yên rastînkî û bingehîn nagere, ew tenê li encaman miqate dibe û bi wan re dikeve keftleftê, wek girtina hin karmendên biçûk, yan destbirîna wan ji kar… û hwd.

Çareserkirina pirsa gendeleyê û rûdawên wê ne tenê bi gotina ye, ew ji dîtina wê, tazîkirina wê, naskirina sedemên wê yên bingehîn, sezakirina kesên wê û ji holêrakirina wan sedeman de dest pê dibe. Ji xwe, pêkanîna wan erkan re jî pêdviyên bingehîn gerek in.

Li serê wan pêdviyan, zor pêwîst e, ku rojê berî hemî alavên ragihandinê serbest bibin û ji bin çengê destlatê û dewletê bi derkevin, ew bibin xudî maf, erk û ji hêla hemi saziyên destlatê de werin rêzdarkirin.

Em tev dizanin, belkî li hemî welatên ku sazûmanên xwe wek yê Sûryayê ne, dezgehên asayişî ne tenê naskirin û çareseriya rûdawên gendeleyê aloz dikin, li bervajî wê, ew rêkê ji bertîl û tiştên din re vekin, **D.R.( 12)**

www.arsivakurd.org

# Rojeke Jinan Taybetmend

**Enehîte Mûrad**

Di sala -1960î- de , li komara Eldomonîkey , hakumdarê komarê Refeyêl Troxêlêyo fermana kuştina hersê xwîşkan Mîrebêl , yên ku di warê mafên jinan de dixebitin. Bi rengekî dirinde , hov û dûrî sincên mirovane didane kuştin . Piştî ew bûyera bi êş û jan tevger û rêxistinên jinên Cîhanê bêdeng nediman, herdem gilî û gazinên xwe hildidane encûmana Netewên yekigirtî . Loma jî , di -17-12-1999-an de , encûmana giştî ya navnetewî ya yekirgtî, di bin bend û biryara -54-134-an de , didît ku -25-ê çirya paşî, bibe rojeke Cîhanî taybet ji bo çareserkirina pirsgirêk û ew rûdawên bive yên ku li ser jinê berdewam in . Digel diyarkirina encûmana yekigrtî, pêwîste hemû dewlet û rêxistinên fermî û yên ne fermî çalakiyên xwe di wê rojê de li dijî zorê û cidahiyê geş bikin ,berê gel û xelkê bidine hişyarî û pejirandina mafên mirovan ! Mixabin li vê dawiyê rapora rêxistina tendurstî ya Cîhanî nîşan dide ku , %70 ji keçan û dora %80 jin dibine qurban. Salê bi milyonan jin têne (îxtîsab kirin). Heyf û mixabin ku , em di sedsala bîst û yekane de, hê jî ev rewşa nîvê civakê binpê û di tariyê de ye ! ? Vêca jî hema em dûr neçin, bi dilşewat û kurtebirîn li ser rewşa jinê di civaka Sûriyê de rawestin ,zor mixabin ku jin qurbana herî hêsan û erzan e. Biher awî ew tê ye xopandin û salê bi dehan di bin perda şeref û namûsê de têne kuştin û birîdarkirin , pir mal kavil û wêran dibin . Zor pêwîste ku em bînin zimên, paya jina Kurd ji ev rewşa ne mirovan e û kirêt dijwartir e. Bi ser her tiştî de ,ew zor û lêdanan dibîne û ji her mafên mirovane bêpare. Her tişt li wê qedexe ye. Lewre jî jina Kurd, di heyameke ne tendurist de, li ber xwe dide !? Ma gelo çiqas şerim û fediye ku , rejîma Sûriyê îmza xwe li pêş raya giştî xistiye binê lîsta mafên mirovan û xwedî lê dernakeve , civaka Sûriyê roj ji rojê, ji hevdu dişele rûdawên biv û bi tirs tê de serî hildidin .

Li dawî, gilî û gazinên me, li basikên Tevgera kurd li Sûryê gelek in , ku bi erik û sitûbariyên xwe di warê civakî de ranabin. Mixabin, wan pişta xwe dane cvaka Kurd û şerê hevdu dikin !. Bêgûman ev yeka tu carî doza gelê Kurd li Sûryê çareser nake, bila win li pêş raya giştî, li der û hundir, nemaze li pêş gelê Kurd rûreş dibin . Hêvî û armanca me ew e ku, win dev ji ezezî û şerê hevdu berdin .Bi biratî , soz û peyman, destên xwe bidin hevdu li doz û civaka xwe xwedî derkevin .

## Berxikê kesk

**B**erxikê kesk , romaneke nû çap bûye û ronî dîtiye , nivîskarê wê mamoste **Azad Ehmed Elî ye ,** ji ( 176) rûpel qetên orte pêk hatiye , zimanê wê zimanê Kurdî ye , û li sala ( 2008) an , bi alîkariya dezgeha **Sema Kurd** ya çand û hunerê , li weşanxana **Hîro li Dubey – Îmarat El- Erebiyê** hatiye weşandin **.**

Em komîta birêvebiriya Newrozê danerê vê berhemê mamoste Azad Ehmed Elî sipas dikin , berhema wî pîroz dikin , û rêza ked û cefayê ku wî di ber de dîtiye digirin . Herweha hêviya me ji xwendekarên zimznê kurdî ew e , ku wê bixwînin , belkîm di paşerojê de hinek ji wan xwêneran derkevin , wê ji aliyê zimên û naverokê ve bidin ber nirxandina rexneweriyê **.**

www.arsivakurdi.org

## Dumahîk : Kurd di …

Sûriyê çi ji dewletê dixwazin , em dixwazin guhdarî te bikin !)) .

Apê Osman li wan vedigerand û digot : (( Hûn dewlet in , di civata neteweyên yekbûyî de hûn endam in , îmza dewletê jî li ser belgenameya mafên mirovan tomarkirî ye …em dixwazin dewlet li gor îmza xwe be , ne zêde !)) .

Mezinê wan berpirsiyarên dewletê careke dî ji Osam Sebrî dipirsî : (( Mamoste Osman , em dixwazin ji te bibihîsin û ji te fêm bikin , hûn Kurd li Sûriyê çi dixwazin? )) . Careka dî Apê Osman li wan vedigerand û digot : (( Em tuştekî zêde ji we naxwazin , tenê weke min gotî , hûn weke dewlet karibin li îmza xwe bibine xwedî , belgenameya mafên mirovan a ku dewleta Sûriyê îmza xwe avêtiye binê wê , bête bikaranîn û ciyê rêzgirtina hemiyan be , ..Sûriyê bi xêr be , emê bi xêr bin birano .)) . Berpirsyar dîsa dipirsî : (( Wekî dî hûn çi dixwazin )) .

O.Sebrî : (( Wekî dî mala we ava )) . Çaya xwe vexwarin û çûn , û ji hîngê ve , rûyê xwe li Osman Sebrî nemandin .

Mebest ji bîranîna vê bûyerê ewe ku , em karibin baş têbigihên , gelo ma cîgeh , rol û kartêkirina belgenameya mafên mirovan di siyaseta dewletan de her diçe qels û kêm dibe , an xurtir û bêtir dibe?. Mirov di wê hêvî û baweriyê de ye ku her diçe xurtir dibe . Osman Sebrî ji hîngê ve , di wê baweriyê de bû ku , divê hemî li ser pirsa mafên mirovan rawestin û di ber de bixebitin û li wê belgenameya navnetewî xwedî derkevin.

Dr. Nûredîn Zaza jî , eger ne bêtir , lê belê ne kêmtirî Osman Sebrî li belgenameya mafên mirovan dibû xwedî , û bi herhawî bi dil û can , çi li civat û têkiliyên xwe yên civakî û normal û çi li hember dadgeh û berpirsiyarên dewletê di ber de dixebitî.

Di vê lêhatinê de hêjayî gotinê ye ku , ew liberxwedana nivîskî ya ku rehmetî Dr. Nûredîn li sala 1960-61 an bi bawerî û serbilindî pêşkêşî dadgeha karbedestiya dewleta Sûriyê kiribû , dimîne jêder û mînakeke dîrokî , hişmend û balkêş , her û her bi kêrî lêveger û xwendinê têt .

Herdu mezinên tevgera siyasî ya kurd li Sûriyê , Osman Sebrî û Nûredîn Zaza bi dil û can li mafên mirovane yên gelê Kurd dibûne xwedî û ewqas jî li dijî nijadperestiyê bûn , bi azadî û biratiya gelan re bûn , ne şerxwaz an jî judaxwaz bûn , ew aştîxwaz û wekhevîxwaz bûn .

Ji xal û naverokên peyman û belgenameyên mafên mirovan ên navnetewî hêjatir , xweştir û binirxtir nînin , ji ber ku hebûn , jiyan û rûmeta min û te dinasin , û di siha nirxên mirovahî yên weha de , doza Aştî , Azadî û Wekheviyê ciyê xwe digre , geş dibe û riya xwe diqelêşe . Li ser vê riya dirêj û dijwar, xebata gelê Kurd her dê bidome û li dar be .

**Sînorê Yekta**

www.arsivakurdi.org

# Lêvger?An
# Lê vegergeh?

R.Elî

Jîn, tevger û çalakiyên mirov, pir tiştên nûjen bi xwe re tînin. Wek nimûne, belkî berî niha bi sed salî, bêjeya ((partî)) bi wateya xwe ya niha bi kar nedihat û nedihat naskirin. Lê di pêvajoya şaristaniyê û jiyana nûjen de, wê bêjeyê şêweyê xwe yê zelal û diyar di warê siyasetê de stand, û roja îro, pîremirov jî û zarok jî, baş dizanin ku wateya bêjeya ((partî)) çî ye.

Lê gereke em ji bîr nekin ku ew bêje, bêjeyeke Kurdî ya kevin e, belkî wê baş wateya xwe siyasî ya niha nedida jî. Lê wateya wê ya kevin jî, ji ya niha ne dûr bû.

Li vê dawiyê, piştî ku (Hevbenda Demoqrat a Kurd li Sûryê)) pêşniyara lidarxistina kongirekî netewî Kurdî li Sûrye kir, bêjeyeke nû(Merci'iye) hat holê û pêwîstî bikarhatina wê çê bû.

Wek adetê, hin nivîskarên siyasî yên zimanê Kudî, pir li xwe neheyirîn, belkî pir tê nefkirîn jî, hema ew bêjeya Erebî wergerandin Kurdî û gotin (pêwîstî bi lêvegereke Kurdî heye).

Di baweriya me de, bêjeya (lêveger) mebesta ku hêvî jê dibe, û ji bo wê hatiye çêkirin û bikaranîn nade, û ji bingeha rêzimên û bêjesaziya Kurdî jî dûr e. Ji ber ku bêjeya em dixwazin gereke vê wateyê bide: Cih yan cîgeha lêvegerê, ne (lêvegerê) bi xwe ye.

Wek em dibînin, ya rastir ew e ku gereke bejeya (lêvegergeh- vegergeh) ango cihê ku veger lê çê dibe û dibe cihê vegerê û lêvegerê bi kar bihata, ew jî li rêza rêzmanî ya van bêjeyan tê: Nivîsgeh, wargeh, biryargeh.. û hwd.

Ji ber ku bêjeya (lêveger- veger) a ku ji Erebî hatiye wergerandin, ew bi serê xwe diyar dike ku mera li tiştekî gumandar û ne tekûz dinêre, hûrik hûrik lê temaş dike û lê vedigere ta sererast û li saz dikeve. Ango (lêveger) mebesta (Merci'iyê) nade. Lê hema (lêvegergeh yan jî vegergeh), diyar û rave dike, ku cihek, warek, komek, civatek, deverek… heye, cihê lêvegerê ye. Eger miriov bixwaze tiştekî jê bixwaze, şêwrekê lê bike, nêrîn, baweriyan û belkî çaresriyan jî bibîse, kane li wir vegere, li wê vegere, ango ew cih dibe lêvegergeh û vegergeh

Loma jî, û hîn em li destpêka bikaranîna wê bêjeyê (têrmê) ne, gereke em xwe şaş nekin û têrm û bêjeya Kurdî ya rast û Ji bilî bêjeya (vegergeh), bêjene din jî wek: Make, Motik, navend, navendgeh hene, belkî ew wê wateyê baş nadin û zelal nakin jî, lê dîsa ji bêjeya (lêveger) rastirin û wateyê jî ji wê baştir şirov dikin.

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de***

www.arsivakurdi.org